

Agahîname: Lîsteya lêçûna Sponsergeriyê

Immigration, Refugees and Citizenship Canada (IRCC) ango Dezgeha Koçrevî, Penaber û Hemwelatîbûnê ya Kanadayê lîsteyek amade kir daku bi grûpên sponsergeriyê bide zanîn ka bi awakî texmînî çiqas dirav pêwîst in daku piştgirî bidine malbateke penaberan bo maweya dazdeh mehan. Ji ber lêçûnên jiyane yê cuda li herêmên cûrbicûr ên Kanadayê, ev lîsteya han weke rêbernameyeke diravî alî dike, hema hema rêjeya alîkariya civakî ji xwe re esas girtiye.

Lîsteya Lêçûnên Sponsergeriyê

Ev Lîsteya Lêçûnên Sponsergeriyê ya li xwarê ji Rêbernameya Diravê ya IRCCyê hatiye standin, tam weke ku di Desteya Daxwaznameya Sponsergeriya Penaberan derbas dibe. Ev lêçûn di adara 2014an de hatine nûjenkirin. Ji kerema xwe li [malpera IRCCyê](#) binêre daku nîrxên herî nûjen bizanin.

Lêçûna Giştî ya Salane ya Niştecihbûnê (\$)	Lêçûnên Destpêkî	Piştgitiya Dahata Diravî bo 12 Mehan	Hejmara Endamên Malbatê
12,600	2,800	9,800	1
21,200	4,400	16,800	2
23,000	5,300	17,700	3
27,000	7,000	20,000	4
29,700	7,200	22,500	5
32,500	8,000	24,500	6
2,500	1,000	1,550	Bo her endamek bêtir

Lêçûnên Destpêkê

Jib o lêçûnên destpêkê pere bo careke tenê tê dayîn bo:

- Tiştmiştên navmalê
- Raêx (mobîlya)
- Cil û mitêl
- Madeyên Xwarinê
- Cilûberg (ên zivistanê jî)
- Deposîta tiştên navmalê
- Bicîhkirina telefonê
- Kirêya meha pêşîn

Piştigitiya Dahata Diravî

Ji kerema xwe balê xwe bidin ku ev nirxên hantexmînî ne û rêbernameyek ji bo qasiya pereyên pêwîst ya herî kêrî nîşan didin. Lêçûnên xanî, xwarin û veguhastinê dibe ku li gorî temenê kesê piştigirîpêdayî û cih werin guhertin.

Lîsteya Kêmkirina Pereyan hember Alîkariya bi Tiştûmiştan (eynî)

Alîkariyên bi tiştûmiştan dibe ku jêderên diravî yê pêwîst kêrî bikin. Ev lîsteya li xwarê ji alîya **IRCC** hatibû dayîn daku nirxa tiştên alîkariyê bi tiştûmiştan texmîn bike li gorî mezînbûna malbatê. Ev nirxên texmînî li ser esasa lêçûna salane ne, û dibe ku bi demê re biguherin. Ji kerema xwe li [malpera IRCCyê](#) binêre daku nirxên herî nûjen bizanin.

Madeyên Xwarinê	Lêçûnên Destpêkê yê Dibistanê	Lêçûnên Destpêkê (Pêdiviyên Navmalê)	Raêx/mob îlya	Cilûberg	Cihê Mayînê	Hejmara Endamên Malbatê
175		325	1,500	500	6,000	1
250		350	2,000	1,000	7,100	2
325		375	2,500	1,375	7,800	3
400		400	3,000	1,750	8,400	4
475		425	3,500	2,125	9,600	5
550		450	4,000	2,500	9,600	6
75	150 bo her zarokê ji 4-21salî	25	500	375	900	Bo her endamêk bêtir evqas zêde bike

Pere û jêderên diravî yê ku malbateke penaberan bi xwe re tînin bo Kanadayê qasa piştigiriya diravî ya pêwîst yaku divê grûpa sponsorgeriyê peyda bike kêrî dike. Lê dîsa jî, ji kerema xwe bale xwe bide ku planeke ji bo rewşên tengaviyê divê.

Nirxa Alîkariyên Civakî ya Cihî

Dema hûn bizanin ka nirxên alîkariyên civakî yê her cihî li herêma we çiqasî ne, dibe ku ew alî grûpa we bike ji bo plankirina piştigiriyên diravî û budceya mehane (mîzaniye). Nirxên han wekî din ji alîya IRCCyê tînin bikaranîn bo diyarkirina piştigiriyên diravî yê Bernameya Alîkariyê bo Veniştêcihbûnê **Resettlement Assistance Program (RAP)** ji bo penaberên ku piştigiriya dewletê distînin. Bi hukmeta cih an jî herêma xwe re têkilî deynin daku agahiya we hebe derbarê nirxên alîkariya civakî an jî piştigiriya dahata diravî.

Refugee Sponsorship Training Program

(Bernameya Rahênanê ya Sponsorgeriya Penaberan)

Tel: 416.290.1700, 1.877.290.1701

Fax: 416.290.1710

E-post: info@rstp.ca

Malper: www.rstp.ca

Nûjenkirina dawî: Adara 2014an